Ş. B. SOREKLÎ

MEHKEMEKIRINA SELAHIDDÎNÊ EYÛBÎ



Weşanên HAYKURD

Institut kurde de Paris

OFFERT
PAR
JOYCE BLAU

Ş. B. SOREKLÎ

MEHKEMEKIRINA SELAHIDDÎNÊ EYÛBÎ



Institut kurde de Paris

Weşanên HAYKURD

WEŞANÊN HAYKURD: 11

Şano : 1

Çapa Yekemîn : 21-ê Adarê 1989

© 1989, Ş.B. Soreklî
Weşanên HAYKURD,Stockholm-SWEDEN

Navnîşan

HAYKURD FÖRLAGET
STENBYGR. 5,6 TR,C/0 CANTEKIN
163 70 SPÅNGA-SWEDEN
***
Printed in Sweden by
APEC-TRYCK & FÖRLAG
Box 3318
163 03 SPÅNGA
***

Postgiro: 88 67 21-0

ISBN 91-87508-10-9

Wêneya bergan:
Selahiddîn Qudûsê digire 1187.
Serîgrafî ji Gustave Dorê.

Institut Kurde de Paris

ŞAHÎNÊ B.SOREKLÎ 1985

MEHKEMEKIRINA SELAHIDDÎNÊ EYÛBÎ

- Bo Robyn -

KESÊN TÊDE:

* SELAHIDDÎNÊ EYÛBÎ...(50-55 sal)
* HAKIM: MÎR EHMEDÊ KAŞO...(50-55 sal)
* EBÛQATÊ GEL: AZAD BÊWAR...(30-40 sal)
* EBÛQATÊ SELAHIDDÎN: XURŞÎDÊ HEMO...(30-40 sal)
* XÛŞKA EL SALIH...(14-17 sal)
* LEŞKEREKÎ SELAHIDDÎN...(30-35 sal)
* BERDESTÊ SELAHIDDÎN...(55-60 sal)
* RÎÇARD DILÊ ŞÊR...Padîşahê Îngilistanê di dema Selahiddîn de (40-42 sal)
* PÊŞMERGE
* NIVÎSKARÊ DADGEHÊ

Institut Kurde de Paris

PERDE

I

DI GIRTÎGEHÊ DE

Odeyek, di hindir de textek, maseyek û îskemeyek heye. Selahiddîn di navbera du dîwaran de dihere û tê... Li pêş deriyê odê pêşmergeyek sekiniye.

SELAHIDDÎN: Ev qe nakeve mêjiyê min! Dibêjin ew ê min bidin mehkeme kirin. Kîne ew? Bo çi? - SELAHIDDÎN BANG PÊŞMERGE DIKE Û BI EREBÎ DIBÊJE: Fî eyyet sine nehnû ya muharib?

PÊŞMERGE: Biborînin Maqûl, ez bi erebî nizanim.

SELAHIDDÎN: Wey, kuro lawo, tu bi kurdî qise dikî! Aferîn, aferîn, we hukmê dewleta musilmanan di destên xwe de hîşt. Hele zû bibêje, ma tu ji mala Eyûb î?

PÊŞMERGE: Na Mîrza, ez pêşmergeyekî Yeketiya Hêzên Kurdistanê me.

SELAHIDDÎN: Sultanê we kî ye?

PÊŞMERGE: Dema sultanan çû,Seyda. Komeke netewî rola sultên girtiye.

SELAHIDDÎN: -XWE BI XWE RE- 'Rol', 'netew'; kurdiya me hebkî hatiye guhertinê.-JI PÊŞMERGE RE-: Em di kîjan salê de ne, xorto?

Institut kurde de Paris

PÊŞMERGE: Em di sala 1993-an de ne Maqûl.

SELAHIDDÎN:-XWE BI XWE RE- Heşt sed sal berê, ez li bajarê Şamê, li paytextê memleketê xwe çûm rehmeta xwedê. -JI PÊŞMERGE RE -: Lawo, ma em li bajarê Şamê ne?

PÊŞMERGE: Na, Seydayê mezin, em li beşekî Kurdistanê yê rizgar in.

SELAHIDDÎN: Kurdistan ji kê rizgar bûye, ji xirîstiyanan? Ma wan dîsa ji Ewropa êrîş kişandin ser musilmanan?

PÊŞMERGE:Biborînin Maqûl, li min tenbe bûye ku ez pirr bi we re şorê nekim. Roja mehkemê ê her tişt belî bibe.

SELAHIDDÎN: Mehkeme bo çi kuro? Ez sultan im; ji xwedê pêve kes nikane min bide mehkeme kirin!

-PÊŞMERGE DENG NAKE-

SELAHIDDÎN: -XWE BI XWE RE- Hele ez wînim bîra xwe; belkî min li kesekî zulm û zordarî kiribe. Ji roja ku ez cara yekemîn bi apê xwe Şêrko re derketim şer, ta roja mirina min, xizmet bo Rebbê Alemê amanca min ya yekemîn bû. Erê, di xortiya xwe de, dema ez di nav şer de bûm, min pirr camêr kujtin. Ti rêyên din tune bûn. Ger min ew ne kujtana, wan ê ez bikujtama.Li milê din, ez ne ji maleke pirr mezin bûm. Bav û apê min di xizmeta mala Zengî de bûn. Ger min di şer de bokebûna xwe xuya nekira, ez ti caran nedi-

Institut kurde de Paris

bûm sultan. Lê dema ez bûm sultan, xwedê dizane, ta ji dest min hat, min mirov ji mirinê xilas kirin. Min bi destên xwe li dervayê şer kesek ne kujt.-DESTÊ RASTÊ RADIKE JOR- Na, ev ne rast e. Min tenê serê Reynoldê Châtillon di hindir konê xwe de bi şûrê xwe qut kir, lê ew bênamûsa layiqê kujtineke wisa bû. Pirr caran min ew af kiribû. Her car wî ji min re sond dixwar ku ew ê vegere Ewropa û careke din bi leşkerên min re şer nake. Dû azadiya xwe, ew dîsa diçû û digel leşkerên xirîstiyanan li dijî me şer dikir. Ew mirovekî bêşeref bû, li gotinên xwe xwedî dernediket. Cara dawîn, dema min ew tev dîlanan dît, min nema êdî dikaribû tehmûl bikim û wisa bi destê min serê wî hat qut kirin.

****
* Peyakî bi kincên kurdî, ji çuxê reş, tê ber *
* derî û kaxezekê dide pêşmerge, yê ku dû xwen- *
* dina wê rê dide wî ku ew têkeve hindir. *
****

XURŞÎD: Roj baş, Mîrzayê mezin, Selahiddîn.

SELAHIDDÎN: Li ser ser û çavên min,mêvanê delal.Wer'danîş û biborînin bi kerema xwe, ez ê nikaribim xwarin û vexwarinê bo te biwesînim. Wek tu dibînî, ez girtî me.

XURŞÎD: Ez bo mazûbantî û zimanxweşiya we zor spas dikim. Hema dixwazim çend gotinan bikim û herim.Bi kere-

Institut Kurde de Paris

ma xwe rûrin û guhên xwe baş bidin ser şorên min.

-XURŞÎD Û SELAHIDDÎN RÛDININ-

XURŞÎD: Navê min Xurşîd e. Xurşîdê Hemo. Sereketiya Yeketiya Hêzên Kurdistanê, rê da ku ez bibim ebûqatê we, sibe dû taştiyan dadgeh destpêdike.

SELAHIDDÎN: Hûn dikarin bi kerema xwe ji min re xuya bikin, ez bo çi curmê têm mehkeme kirin?

XURŞÎD: Zor mixabin Maqûl, hin mirovên kurd sûcekî pirr mezin kirine stûyê we. Wan ji sereketiya Yeketiya Hêzên Kurdistanê xwestine ku hûn li ber dîrokê werin mehkeme kirin. Bi gotina wan, we xiyaneteke mezin bi gelê kurd re kiriye.

SELAHIDDÎN: Berêz Xurşîd, ev çi gotin e? Min tu caran xiyanetî bi gelê kurd re, xwedê dizane, ne kiriye. Belkî ev sûca bo kujtina çend kurdên me kirine stûyê min! Ew ên ku tev Heşaşan dixebitin. Bi rastî ew mirovên bêhiş bûn. Min pirr caran ji wan re xeber şand ku ew tev Heşaşan kar nekin. Min got, ez amade me kar û wezîfan di dewleta xwe de bidim wan, lê ew nehatin ser rê.Ew di bin tesîra dijmin de man û li dijî eşkerên min şer kirin. Tew du caran hindik mabû ez bi destên wan werim kujtinê. Xelk bi wan dikenî, heşîş didan wan û bi navê terîqetê dişandin mirinê.

XURŞÎD: Maqûl biborînin, min şora we bi şekir qut kir,lê mesele ne ew e.Hûn bi sûcê ku we xiyanetek bi gelê kurd re kiriye tên mehkemekirinê. Li şûna hûn

Institut kurde de Paris

empiratoriyeke kurdî damezirînin, we xwe û bi hezaran peyayên kurd bo misilmantiyê kirine êzing; we tiştek bo gelê xwe nehaniye cîh û wisa we rewşa kurd û Kurdistanê bi sedsalan paşve xistiye! -SELAHIDDÎN DIXWAZE BIPEYIVE, LÊ XURŞÎD ŞORA XWE ZÛ DIDOMÎNE- Maqûl, hûn dikarin bi serbestî di mehkemê de ber xwe bidin. Ez hatim bibêjim, sibê mehkemekirina we destpêdike. Ji niha ta sibê hûn ê bikaribin baş bihizirin. Tika min ji we ew e ku hûn hûr û kûr bihizirin. Cezayê xiyanetê di van rojan de zor giran e. Ez dixwazim hûn bizanibin, li ba min tu guman tune ku hûn bêsûc in. Lê divê ku em zor miqayit bin, bo em nekevin feqên ew ên dixwazin we bidin cezakirinê. Mesela we meseleke zor tevlîhev e. De bi xatirê we; wek min got,hûr û kûr bihizirin.

SELAHIDDÎN: Zor spas, Berêz Xurşîd, xeman mekişin.Wek dibêjin, xwedê yek e, derî hezar in. Xwedayê gewre çi biryar dabe, ê wisa jî bibe. Tenê daxwazeke min heye ji te.

XURŞÎD: Fermû Mîrza, daxwaza we çi ye?

SELAHIDDÎN: Ez dixwazim ku kesekî zane were tev min rûne. Ji ber ku di navbera nimêja muxrib û yasiyan de, bi min re liser rewşa cîhanê ya îro biaxife.Ger zanibûna min liser rewşa dinê ya îroj rind be, ez zû-zû nakevim dehfê.

XURŞÎD: Liser çavan daxwaza we. De bi îzna we, ez ê herim.

Institut kurde de Paris

Xurşîd ji odê derdikeve. Selahiddîn dest-pêdike dîsa di hindir odê de here-were;bi xwe re dike kuste-pist. Geh serê xwe dihe-zîne, geh xwe bi xwe re dikene.

PERDE TÊ XAR

PÊRDE

II

DADGEH : RÛNIŞTINA YEKEMÎN

Liser beşekî dîwarê paşîn: SAL 1993
ŞÛN Beşekî Kurdistanê yê Rizgar

Di navîna oda mehkemê de hakim rûniştiye.Li ser maseya wî pirtûk, kaxêz, dosî û defter hene. Selahiddîn û Xurşîdê Hemo li kêleka hakim ya rastê rûniştine. Azad Bêwar,ebûqatê gel, li ya çepê rûniştiye. Di navbera hakim û Azad de nivîskarê dadgehê cîh girtiye û notan digire. Li dawiya odê pêşmergeyek sekiniye.

-HAKIM BI MÊKUT LI MASÊ DIXE-

-NIVÎSKARÊ MEHKEMÊ RADIBE SER XWE, BERÊ XWE DIDE KOMA GEL,

-TEMAŞEVANAN- : Bi navê gelê Kurdistana mezin, ez ji hemû kesên di rûniştina îroj de beşdar in di-

Institut kurde de Paris

xwazim ku hûn rabin ser xwe.

-HER KES RADIBE SER LINGAN-

NIVÎSKARÊ DADGEHÊ:Bi navê gel û bi xwaztina komeke nişti-manperwerên kurd, mehkemekirina Selahiddînê Eyûbî niha destpêdike. Hakim, Mîr Ehmedê Kaşo ê guhên xwe bo herdu hêlan veke.

-HAKIM RÛDINE Û DÛRE HER KES LISER ÎSKEMEYA XWE ŞÛNÊ DI-GIRE-

HAKIM: Berêzê bi qedr û qîmet, Selahiddînê Eyûbî. Ez hakimê beşê Kurdistanê yê rizgar im û ji hêla gel de hatime hilbijartin. Bi kerema xwe, xwe bi gel bidin naskirin.

SELAHIDDÎN:Navê min Selahiddîn Yûsif e. Ez kurê Necmeddînê Eyûb im. Di sala 1137-an de li bajarê Tekrîtê hatim rûyê dinê û bi navê Selahiddînê Eyûbî an jî Seladîn, têm naskirin

HAKIM: Hûn li ku mezin bûn?

SELAHIDDÎN:Roja ez ji dayka xwe bûm, bavê min malbat li hev civand û berê me da bajarê Helebê. Wisa ez li Helebê mezin bûm û ketim xwendegehan.

HAKIM: Di roja hûn bûyî de mala we bar kir! Bo çi bavê we hûn birin bajarê Helebê?

SELAHIDDÎN:Sultan Îmadiddîn Zengî wezîfeyek dabû bavê min. Zatî apê min Şêrko li wir serokê leşkerên Suriyê bû.

Institut Kurde de Paris

HAKIM: Bêguman berêz Xurşîd ji we re got, hûn çima îroj li vir in. -DESTÊ XWE YÊ RASTÊ BERBI ÇEPÊ DIRÊJ DIKE- Ez Berêz Azad Bêwar bi we naskirin bidim.Ew komeke welatparêzên kurd temsîl dike. Ew ên ku ji me xwaztine, em we bo xiyaneta we ya gewre di derheqê gelê kurd de,-ev bi gotina wan- bidin mehkemekirin.

SELAHIDDÎN:Erê, hakimê xoşewîst,haya min jê heye.Ez vî sûcî napejirînim. Ta ji destê min were der, ez ê bikim ku bêsûcbûna xwe ji we re îspat bikim,lê gotina dawîn di destê we û yê xwedê de ye.

HAKIM: Baş e. Bi kerema xwe werin maseya îfadê.

-SELAHIDDÎN DIHERE MASEYA ÎFADÊ-

****
* Maseyeke mezin û îskemeyek ê li şûneke muna- *
* sib hatibin danînê. *
****

HAKIM: Berêz Azad, fermû, pirsên xwe bipirse.

AZAD: Selahiddînê Eyûbî, hûn kurd in an na?

XURŞÎD:Hakimê gel, ez vê pirsê paşve vedigerînim.Mafê berêz Azad tune ku pirsên wisa bêsûd bipirse. Hemû cîhan dizane ku Selahiddîn kurd e.

HAKIM: Barêz Azad, mebesta te bi vê pirsê çi ye?

AZAD: Maqûl, bersîva vê pirsê bo me û bo Selahiddîn jî zor girîng e. Ger Selahiddîn bibêje, ew ne kurd e,em ê gilî û gazincên xwe paşve bikişînin. Bi mîlyonan mirovên kurd di hindirî zikên sedsalên bihûrîn de ki-

Institut Kurde de Paris

rasê kurdayetiyê bo sedemên olî, sûda şexsî û yan jî ber zulm û zorê ji xwe şeqitandine û bûne endamên gelên dine. Ger Selahiddîn yek ji wan e, Xwedê tev wî be, wek dibêjin, em wî nadin mehkemekirin.

SELAHIDDÎN:Mîrza, min tu caran kurdbûna xwe înkar nekiriye; ez îroj jî nakim. Ez kurd lawê kurdan im.

AZAD: -BI GEL RE DIPEYIVE- Xûşk û brayên hêja, wek hûn dibihîsin, Selahiddîn înkar nake ku ew kurd e. Wisa mafê me heye ku em wî bidin mehkemekirin û cezayekî giran bidin wî.

-BI SELAHIDDÎN RE- Bi sedsalan, bi taybetî di sedsalan bîstan de, tade û neheqiyên ku li gelê kurd bûne nayên hejmartin. Zimanê me, edebiyata me, şahî û serfiraziya me, dîroka me; erê, hebûna me bi xwe jî ketin binê lingan. Bi sedhezaran, na bi milyonan mirovên me bi şûr û gulle, agir, serma, birçîbûn, lêdan, dardekirin, nexweşî û belengaziya bindestbûnê hatin kujtin. Ez ê niha hin wêneyên sedsala bîstan raber we bikim, bo ku hûn bi çavên xwe bibînin çi hatiye serê gelê kurd.

Institut kurde de Paris

****
* *
* Ger ji dest were, diyapozîtîf bi projektorê *
* liser dîwarekî odê tên nîşandanê. Eger ku mecal *
* tunebe, wêne û rojnameyên kevn li ser dîwarekî *
* têyên rêzkirin. *
* *
****

XURŞÎD:-BI QAR(QEHIR)- Hakimê gel, ez li dij dertêm. Ma sûcê Selahiddîn di ev bêtarên bûyî de çi ye?

AZAD:-BI DENGEKÎ BILIND- Çawa sûcê wî çi ye, Berêz Xurşîd? Ma ew ne sultan bû?

HAKIM:-DESTEKÎ XWE SÊ CARAN LI MASÊ DIXE- Berêz Azad, bi kerema xwe dengê xwe pirr rameke jor. Axaftina xwe bidomîn.

AZAD: Welatê me hat parvekirinê, tar û mar bû, gundên me hatin şewitandin, bombeyên napalm û fosfor bi ser gun diyên me de berdan xar, em bi bombeyên erdê ji hev veqetandin, merî-mal û hêzên me lihev kirin dijmin û hîn pirr tiştên din!.. -KESEREKE KÛR DIKIŞÎNE-Bi bîrûbaweriya me, Selahiddînê Eyûbî, heke we rêçikeke rast di derheqê gelê xwe de, di rojên ku hûn tê de sultan bûn, girtiba, gelê kurd di ev demên tarî re ê derbas nebûya. Selahiddînê Eyûbî, we bo çi sûda gelê kurd nehanî ber çavan?

-XURŞÎD DIXWAZE BERSÎVÊ BIDE, LÊ SELAHIDDÎN DESTEKÎ XWE BERBI WÎ DIRÊJ DIKE KU EW DIXWAZE BERSÎVÊ BI XWE BIDE-

SELAHIDDÎN:Biborînin Berêz Xurşîd, ez dixwazim bi xwe bersivên ji min tên xwaztin bidim.-LI AZAD DINIHÊRE- Hin mirov li dinyê hene, dema barê wan dikeve, ew destpêdikin li dorhêlên xwe sêrkin. Belkî yekî bibînin bo ketina barê xwe di stûyê wî kin. Ez ne sedema ketxarina barê kurdan bûm; min qedr û qîmeta wan bilind kir...

AZAD:-BI QAR(QEHIR)- We qedir û qîmeta kurdan bilind nekir; we qedr û qîmeta xwe bilindkir. Ereb û tirk her dem li dijî kurdbûna we bûn. Loma we kurdayetî da hêlekê,

Institut kurde de Paris

bo hûn ji wan re îspat bikin ku amanca we ne xizmetkirina kurdan e, lê serketina misilmanan e. Bi vî hawî, we hêvî dikir ku ew hurmetê bidin şexsê we û seroketiya we bipejirînin...

XURŞÎD:Mîrza hakim, bi rastî ew ne tiştekî baş e ku Berêz Azad, hema dema ew bixwaze, şora Selahiddîn di nîvî de bibire.

HAKIM: Berêz Azad, bike ku tu, bi kerema xwe, axiftina Sellahiddîn wisa qut nekî! Selahiddîn, bi kerema xwe bidomîne.

SELLAHIDDÎN:Min digot, ku ez ne sedema ketina barê kurdan im. Roja ez çûm heqiya xwe, ji Yemenê bigir ta sînorê Fars di bin destên mala Eyûbî û mîrên kurdan yên din de bûn. Ger ew rast be, sûcê min çi ye, ger memleketê min dû mirina min tar û mar bûye?

AZAD: Memleketê we ne memleketekî kurd bû. Ew empiretoriyeke îslamî bû. We kumê kurdayetiyê ji serê xwe danîbû û kumekî din dabû serê xwe...

XURŞÎD: Ev gotina ne gotineke rast e.

AZAD: Ne rast e ha? Navên kurên we çibûn Selahiddîn?We navên wek El Ezîz, El Adil, Ezzahir li wan kirin.Gelo gola navên kurdî miçiqî bû ku we nedikaribû navekî kurdî hema ji hevdeh kurên xwe li yekî bikira? Gelo bo çi we xwendegehên bi zimanê kurdî venekirin? We bo çi kurdayetiya xwe bi hawakî gurtir nehanî holê? Ji ber ku di dilê we de tim tirseke mezin hebû ku belkî ereb û tirk gazincan bikin, an serokatiya sul-

Institut kurde de Paris

tanekî kurd nepejirînin.

XURŞÎD: Edaleta Selahiddîn li hemû beşên cîhanê bi nav û deng e. Ta roja îroj, çîrok û helbest liser rastbûna rêya hukmê wî, li ser wekheviya di bin siya şexsê wî de pêk dihat û li ser aqilmendî û rindiya wî têyên nivîsandin. Lê dû ku wî wefat kir,tirk û ereban, ta ji dest wan hat der, kirin ku kurdbûna wî veşêrin. Dema ew sax bû jî, tirkan li dijî kurdbûna wî propaganda belav dikirin. Digotin:ku "ev mirov ê çawa wek sultanekî musilmanan were pejirandin? Ew ne tenê kurd e, lê ji maleke ne weqa binav û deng e; tenê Şêrko di mala Eyûbî de ber wî dihat naskirin."

Ereban jî digot ku pêxemberê îslamê ereb bû û quran jî ji hêla xwedê de, bi erebî hatiye daxistin. De em ê çawasultanekî ji kurdên çiyan qebûl bikin? Îroj jî pirtûkên dewleta tirkan wî wek mirovekî tirk didin naskirinê. -JI HÊKIM RE- Hakimê gel,ew kela ku hîn îroj li Binanê bi navê kela kurdan tê naskirin, ew pirtûkên ku di pirtûkxanên cîhanê de têyên dîtin, hemû şade ne ku Selahiddînê Eyûbî ti caran ji kurdayetiya xwe guman nekiriye.

AZAD: -DESTEKÎ XWE RADIKE JOR Û BI QERF- Wel, wel, wel,kurdayetiya Selahiddîn! Erê, pirtûkên cîhanê dibên Selahiddîn ji maleke kurd e, lê giranî her dem li ser musilmantiya wî ye. Navên zarokên wî baş xuya dikin.

SELAHIDDÎN:Erê, rast e, navên zarokên min navên ereban bûn,

Institut Kurde de Paris

lê ez ê çi bikim? Zimanê musilmantiyê zimanê erebî ye. Di rojên min de netewa gelan û nîştimanperwerî, wek ku îroj tên naskirin, li holê tunebûn. Padîşa û mîrên xiristiyanan, ji Îngilistanê ta Gurcistan û Ermenistanê li dijî gelên musilman bûbûn yek. Ger min ew ji Filîstînê dernexistana, qulpika wan bi wir tenê nedihat. Wan hêdî hêdî ê hemû erdê musilmanan di bin lepên xwe bikirana; Kurdistan jî tevê.

AZAD: Bi kerema xwe vê yekê li serê me meke minet, Selahiddîn! Kî dibêje ku rewşa me kurdan ê di bin hukmê Firencan de ne baştir bûya? Bi hezaran endamên gelê me bo musilmantiyê mirin; zana û nivîskarên me zanibûna xwe bo îslamê kirin diyarî. Çêyiyên me bi tirk, Faris û ereban re bi navê biratiya musilmanan kirî, hemû bûn kuç û kevir, paşve vegeriyan, li rûyên me ketin.

XURŞÎD: Ger hevalên me rindiyên me bikin xirabî û li me vegerînin, sûc ne yê pakbûna dilên me ye, lêbelê yê reşbûna dilên wan e.

AZAD: Bi rastî ez matmayî dimînim, dema ebûqatekî bi navûdeng wek te, Berêz Xurşîd, nikare bi hawakî kûr û objektîv rewşê bide ber çavan! -JI HÊKIM RE- Rê bidin ez çîrokeke pirr kin ji we re bêjim. Li gundekî, di demên kevnar de, du eşîr dijîn. Eşîra Bokan û eşîra Nokan. Hesingerê gund ji eşîran Bokan bû, navê wî Hoste bû. Hoste çêtiriyên şûrên xwe ji endamên eşîra

Institut Kurde de Paris

Nokan re çêdikirin,ji ber ku wî ne dixwazt kes rojekê bibêje, welle Hoste şûrên rind ji eşîra xwe re çêdike. Hoste û endamên eşîra wî qet nedihanîn ber çavan ku belkî rojekê şer di navbera her du eşîran de cîh bigire. Dema ew roja hat, eşîra Nokan bi alîkariya şûrên Hoste, eşîra Bokan ji xwe re kirin kole. -JI XURŞÎD RE- Koledarî û bindestbûna eşîra Bokan, sûcê kê ye ez benî, Bokan lê Nokan?

Dema endamên gelekî fersendê bidin endamên gelekî din, bo yên din bibin serdar û ew bi xwe jî kole,ew sûcê dilreşiya yên serdar e, lê yê bextereşiya yên bindest e? -TI KES BERSIVÊ NADE-

AZAD: Di nav leşkerên we de endamên hemû gelên musilman hebûn, Selahiddîn, ne wer bû?

SELAHIDDÎN:Belê, lê pirr ji wan kurd bûn û hejmareke ne piçûk jî, ji neteweyên ereb û tirk bûn.

AZAD: Hin caran di navbera leşkerên we de teşqele çêdibûn. Mezintiriyên wan teşqelan di navbera kîjan koman de cîh digirtin?

SELAHIDDÎN:Mezintiriyên teşqelan di nav yên kurd û tirk de cîh digirtin.

AZAD: Hûn dikarin bi kerema xwe ji me re bidin zanînê,çima? Çima weqa teşqele di navbera van herdu koman de cîh digirtin?

SELAHIDDÎN:Pirr caran bo tiştên piçûk û meseleyên vala,lê qeymaxê sedemê ew bû ku wan ji hev heznedikirin. Leşkerên kurd bi yên tirk qeşmerî dikirin û peyvên kêm davêtin wan. Hin caran bi navên

Institut Kurde de Paris

wek kose û yan jî manxol (moxol)bang wan dikirin; û tiştên wisa. Leşkerên tirk jî ji yên kurd aciz dibûn, ji ber ku bi dîtina wan, rewşa kurdan ji ya wan çêtir bû. Kurd zû zimanan fêrdibûn, jîr bûn, zimanxweş bûn.Bo van tiştan, yên tirk dilreşî dikirin. Pirr caran jî, bi taybetî dema ez ne amede bûm, bo parvekirina talanê lihev nedikirin.

AZAD:Baş e, di rewşên wisa de we pişt kê digirt?

SELAHIDDÎN:Pirr caran min ev wezîfa dida mamûrekî xwe,bo ew herdu seriyan lihev wîne. Ta ji dest min dihat der, min ti ferq nedikir navbera leşkerên xwe.

AZAD: Bi zanibûna min, we pirr caran bêtir pişt tirkan an ereban digirt. Ji ber ku we di dilê xwe de digot ku bila kes nebêje, Selahiddîn pişt kesên xwe digire. Da xelk pesna we bide û bibêje, Selahiddîn mirovekî pirr adil e. Rojekê we emir da ku yek bîst û pênc şîrmaqan li pişta leşkerekî kurd, bi navê Soro xe, ji ber ku wî ji leşkerekî tirk re gotibû,"lawê mangan". We fersend neda Soro, bo ew belî bike, bo çi wî ev gotina kêm ji yê tirk re gotiye. Dîsa jî Soro bi dilekî vekirî bi cezayê hatî dayîn razî bû.

SELAHIDDÎN:Dema ez hatim ser hukim, ti hevgirtin li holê tunebû. Ti kesî gullê kesekî din nedikir. Li her gund û bajarî yekî xwe kiribû serokekî mezin. Min dizanibû, ger ez bixwazim xwe bigihînim amanca xwe, divabû ber her tiştî dîsîplîn

Institut kurde de Paris

di nav leşkerên min de hebûya. Bi xêra dîsîplîn û fêdekarbûna leşkerên min, ji dest min hat der, bi hêzeke ne weqa gewre, pişta dijminên xwe bişikênînim; yên ku bi deh hezaran leşker di bin destên xwe de didîtin. Wek min berê jî da zanîn , di dema min de xiristiyan û musilman li hember hev bûn. Amanca mezin hilweşandina tevdêra êrîşvanên biyanî bû, ne ku damezirandina empiratoriyeke kurdî bû.

AZAD: Selahiddînê Eyûbî, bi rastî şansê malbata we baş bû. Jiyana apê we Şêroko û jiyana we bi xwe jî,wek jiyana Ebû Muslimê Xurasanî ne hat dawiyê.

XURŞÎD:Hakimê mezin, ev şora Berêz Azad dike ne di şûnê de ye. Girêdana mirina Ebû Muslimê Xurasanî, bi mesela me ve bo çi ye?!

AZAD: Ebû Muslimê Xurasanî jî, şûr, jiyan û hebûna xwe kir xizmeta musilmantiyê. Rojekê Emîrê Ebbasiyan, Ebû Cafer El Mensûr, ew vexwende konê xwe û ferman da ku dest bi lêxistina êldefiyan bibe. Dû re ferman da leşkerên xwe ku ew Ebû Muslim qut qutîn bikin. Ebû Muslim hanî bîra Emîrê Ebbasiyan ku wî çiqa bo êla wan şer kiriye, wî çawa bo serketina şorên Ebbasiyan bi sedan caran mirin daye ber çavan. Ebû Cafer El Mensûr li wî vedigerîne û dibêje: "de here lawikê biyanî, ger min şûrê Ebbasiyan têxista destê ebda xwe ya reşik, ê wê jî karê te kirî bikira". Wisa leşkerên ereb laşê Ebû Muslim qut qutîn kirin; ji

Institut Kurde de Paris

dengê êldefiyan kesekî dengê qîrîna Ebû Muslim, yê ku bi xedir û xiyanet hat kujtin nebihîst.

-SELAHIDDÎN SERÊ XWE DATÎNE, YÊN DIN LI RÛYÊN HEV DINHÊRIN, AZAD RÛDINE-

HAKIM: - LI SAETÊ DINHÊRE-Rûniştina îroj wisa dawî bû.Dadgeh ê sibê mehkemekirina Selahiddînê Eyûbî bidomîne.

PERDE

III

DI GIRTÎGEHÊ DE

Selahiddîn di hundir odeya xwe de rûniştiye. Liser maseya wî tiji pirtûk, rojname, kovar û wêne ye. Pirtûkek di destan de, ji ser îskemê radibe û di hundir odê de dihere û tê.

SELAHIDDÎN:Ez sultanê memleketên musilmanan bûm, ne yê Kurdistanê. Îroj felsefe û siyaseta cîhanê hatiye guhertin. Ne ji mafê kesiye, min ligora baweriyên -rojên- îroj bidin mehkemekirin. Xwedê dizane ku min rindî û xweşî bo gelê xwe yê kurd dixwazt. Dema ji Yemenê ta Kurdistanê ketin bin hukmê memleketê min, li ser min şert bû ku ez

Institut Kurde de Paris

wekheviyê di memleketê xwe de wînim holê û wisa gelên wan welatan hemû di bin seroketiya min de bûn gelek û gelê min di welatekî musîlman de cîh hilgirt.-HEBKÎ DIHIZIRE- Eger di derheqê kurdan de kêmasî hebûye, ew ne sûcê min bûye. Lê yê mîrên kurdan bûye ku li Kurdistanê hukim dikirin. Zemanê min tunebû ku ez di gelşên kurdan de bihizirim.

Min pirr dixwazt, lê ji dest min nedihat der. Dawiya teşqelan nedihat. Hin caran ez bi mehan ji malbat û zar-zêçên xwe dûr diketim, ji piştê hespê peya nedibûm. - KENEKÎ SIVIK TÎNE SER LÊVÊN XWE. PIRTÛKÊ LISER MASÊ DATÎNE. HER DU DESTÊN XWE DIDE PAŞ PIŞTA XWE Û DÎSA DIHERE Û TÊ - Di sala 1182-an de ez li bajarê Qahîrê bûm. Xeber ji min re hat ku li Filistînê dîsa teşqele hene. Di berbanga sibê de min berê xwe da Filistînê. Li wir ji min re gotin ku li bajarê Şamê dîsa hin xêrnexwazan fitne berdane nav gel. Wisa min û hin leşkerên xwe, me berên xwe dan bajarê Şamê. Li wir, me da rêya Hums û Hema. Li Hema ji min re gotin ku dîsa li Helebê li dijî hukmê min şorên ne baş tên belavkirinê. Bê ku rawestim, min berê hespê xwe da Helebê. Ji wir ez siwar bûm çûm munbicê. Li wir ji min re gotin ku li Bîracik û Diyarbekirê teşqelan destpêkiriye. -HEBKÎ DISEKINE, DIHIZIRE, SERÊ XWE DIHEJÎNE Û DÛ RE DÎ-

Institut kurde de Paris

SA DIDOMÎNE. HEBKÎ BI QAR (QEHIR)- Dibêjin min Kurdistan îhmal kiriye. Di dema min de pirtûkxana bajarê Diyarbekirê ji pirtûkxaneyên cîhana îslamê hemûyan mezintir bû. De ez çi bikim, ger dû mirina min ro ji ser Kurdistanê çûbe ava. -LIPAŞ MASÊ, LISER ÎSKEMÊ RÛDINE. ÇENGEYA XWE DI DESTE RASTÊ DE BI CÎH DIKE Û DIHIZIRE. DÛ NÎV DEQE, SERÊ XWE PIÇEKÎ RADIKE Û WEK MIROVEKÎ KU NAXWAZE KES WÎ BIBIHÎZE- Ez dizanim, ta ji dest wan dihat, wan teşqele û fitne li dijî min dikirin, ji ber ku ez kurê gelê kurd bûm. -BI NIŞKAVE RADIBE SER LINGAN- Min çi digot? Belê, ji Diyarbekirê min dest pê kir ku li ser gund û bajarên Cezîrê bigerim. Di wê demê de xeber gihandin min ku hin kesan li çiyayên Sincêr û Hewlêrê îsyan kirine. - CAREKÊ BI DENGEKÎ QEBE DIKENE Û DESTÊN XWE LI HEV DIXE- Di hundirî sêçar mehan de, ez ji bajarê Qahîrê gihîştim Hewlêrê û ji wir min dîsa berê xwe de Qudisê û li Filistînê vegeriyam. De min ê çawan zeman ji bo Kurdistanê bidîta?! Min digot ku mîrên Kurdistanê ê ev fersenda zêrîn ji xwe re bikin qulp û wezîfa xwe di derheqê gelê xwe de wînin şûnê. -DIHERE TIZBIYÊ XWE JÎ SER MASÊ RADIKE- Eşhedû en la îlahe îllellah we eşhedû enne muhemmeden resûlullah. -DISEKINE, WEK KU TIŞTEKÎ GIRÎNG HAT BÎRÊ- Di derheqê zimên de, dewr dewra zimanê erebî bû. Quran û hedîs bi erebî bûn. Erebî

Institut kurde de Paris

zimanê ol û dewletê bû. Ev ne tenê bo kurdan û li Kurdistanê; li hemû welatên musilmanan rewş wisa bû. Pêxember ereb bû. Muftî û melayên ola îslamê digotin ku çawa şîr bê mast hêvan nagire wisa musilmantî jî bê zimanê erebî nabe. Hemû alimên cîhana îslamê, tev wan kurd jî, ne bi zimanê gelên xwe, lê bi zimanê erebî girîngtiriyên nivîsên xwe dinivîsandin. Wisa erebî bûbû zimanê xwedê û hukmatê. -DISEKINE, HERDU PIYÊN XWE RADIKE JOR, WEK KU GAZINCAN DIKE- Berêz Azad dibêje, min emir daye, bila 25 şîrmaq li pişta leşkerekî kurd de bêyên lêxistin. Ev rast e, lê bi tiştên wisa hûrik, mirov dikare dilên yên biyanî bo xwe veke û wan bo xwe bike piştgirt. Endamên kurd di nav leşkerên min de tiştên wisa fehm dikirin û dizanibûn ez yekcaran wan hebkî dêşînim, lê dadiqultandin, Ji ber ku wan baş dizanibûn, dilê min bi wan re ye,dijminên min pirr i. Wan dizanibûn ku bi kirinê, gotinê, mirovê kurd li ser bû. Tirs û xofa kurdan di dilê ereban,tirkan,silcûqan,firencan û yên din de hêlûn çêkiribûn. Dijmin û dostan bi serên kurdan sond dixwarin. -DIHERE RÛDINE Û DÎSA DEST BI XWENDINE DIKE. ÎCAR ROJNAMEYEK KEVN DIXWÎNE. HÊDÎ HÊDÎ DENGÊ XWE BILIND DIKE- " Li Dersimê bi hezaran kurd bi gule û bombeyên tirkan hatin kujtin; bi hezaran bi hukmê zorê ji

Institut Kurde de Paris

gundên bapîrên xwe hatin derxistin." -WÊ ROJNAMÊ DATÎNE, YEK DIN RADIKE- " Qazî Muhemmed,serokê kurdên rohilat, tev endamên hukmata Komara Mehabadê li qada bajêr hat dardekirin." -WÊ ROJ_NAMÊ DATÎNE, YEK DIN RADIKE- Balafirên Mîg yên hukimata Iraqê, bombeyên Napalm û Fosfor bi ser gundên kurdan de berdidin." - ÊDÎ BI LEZ ROJNAMEYEKÊ DATÎNE, YEK DIN RADIKE- "Sînorên di navbera Tirkiyê, Iraqê û Îranê de ji gundiyên kurd hatin valakirin; zimanê kurdî li Kurdistana Bakur (di nav sînorên D.Tirkiyê de) qedexe ye; leşkerên hukimatê jinên kurdan li şûna bêderan şilf-tazî dikin; mafê kurdan tune di komcivîn û festîwalên navnetewî de cîh bigirin."-ROJNAMAN LI SER MASÊ GÊR DIKE Û DESTÊN XWE SÊ CARAN BI QAR(QEHIR) LI RÛYÊ MASÊ DIXE- Na,na,na...ma curmên wisa di welatên musilmanan de mumkin in? Ey Rebbê Alemê, çawa dihêlî neheqiyên wisa li gelê min bibin? Ma musilman li dinê neman?! Bûyerên wisa,yên kafir bile li kesên din nakin! -SELAHIDDÎN LI SER ÎSKEMÊ RÛDINE, RÛYÊ XWE DI NAV HERDU LEPÊN XWE DE VEDIŞÊRE Û DIGIRÎ-.

Institut kurde de Paris

PERDE

IV

MEHKEME: RÛNIŞTINA DUWEMÎN

HAKIM: Berêz Xurşîd, di rûniştina bihurî de, Berêz Azad Bêwar pirr gotin di derheqê Selahiddîn de gotin.Bi bîrûbaweriya wî, Selahiddîn sûda gelê xwe, mebesta min gelê kurd e, nehaniye ber çavan. Bi dîtina wî, eger Selahiddîn, dema ew sultan bû, rewşa Kurdistanê û wêbêya gelê kurd baş daba ber çavan, rewşa me îroj ê bi hawakî din bûya. Wisa, ew destjêberdana Selahiddîn di derheqê xelkê bapîrên xwe de wek xiyanetek mezin dihesibîne û daxwaza Berêz Azad ew e, Selahiddîn bo vê xiyanetê, bi gotina wî, were ceza kirin. Tu dikarî ji mehkema gel re îspat bikî ku dîtina Berêz Azad ne li şûnê ye?

-XURŞÎD JI ŞÛNA XWE RADIBE. PELEK KAXEZ DI DESTAN DE, DI HUNDIR ÛDEYA DADGEHÊ DE HÊDÎ HÊDÎ DIHERE TÊ, GEH LI HÊKIM, GEH LI AZAD, GEH LI SELAHIDDÎN Û GEH JÎ LI TEMAŞEVANAN MÊZE DIKE-

Bi bîrûbaweriya min, hakimê gel, ew îhaneteke mezin e bo mirovtiyê û bo dîrokê, dema yek curmeke wek xiyanetê di stûyê camêrekî wek Selahiddînê Eyûbî ke.Li cîhanê û di dîrokê de sultanên wek wî pirr hindik in. Bi hezaran pirtûk, gotar, helbest û çîrok li ser rastiya hukmê wî û rindbûna xusetê wî hatine nivîsandinê. Bi gotina ansyklopedyayên cîhanê û bi bîrûbaweriya dîrokzaneyên gellek welat-

Institut Kurde de Paris

an, di dîroka ola îslamê de ti sultanên wek Selahiddîn adil, boke, zor, bêtirs, dilbirehim û amancpak hîn nehatine ser îskemeya karbidestiyê.

AZAD: Ez dixwazim bidim zanînê ku em ev tiştên Berêz Xurşîd dibêje înkar nakin. Em di Selahiddînê Eyûbî de beşê wî yê kurd di derheqê netewa kurd de xayin xuya dikin. Bi peyvên din, em Selahiddînê kurd, ne yê musilman, bi sûc derdixin û dixwazin bidin cezakirin.

HAKIM: Biborin Berêz Azad, bila Berêz Xurşîd gotina xwe bidomîne. Tu dikarî notan bigirî û dûra rexneyên xwe bêjî, bîrûbaweriya xwe bidî zanînê.

XURŞÎD: Zor spas. Min dixwast bidim zanîn, heke ez li ser çêyî û rindiyên Selahiddîn, yên ku ji hêla dîrokzanan, nivîskaran, yên ew nasdikirin û yan kirinên wî dîtibûn de hatine nivîsandin, ji we re bipeyivim, pêwîste em bi hefteyan di hindir vê odê de bimînin.

Di rûniştina îroj de, ez dixwazim bang çar mirovan bikim, yên ku di dema Selahiddîn de dijîn. Bo ew bi kinî ji me re bidin zanîn, ka Selahiddîn çi mirov bû. Ez niha bi qayilbûna dadgehê bang şahdeya yekemîn dikim. -BERÊ XWE DIDE DERÎ Û BI DENGEKÎ QEBE - Bila keça delal, ya bi qedir û kemal, xûşka Padîşah Essalih Îsmaîl bi kerema xwe were hindir. -KEÇEKE NARÎN, HERDU DEST LI SER NAVÊ, SERÎ HEBKÎ BERBI JÊR XAR, DIKEVE HINDIR. DEMA ÇAVÊN WÊ LI SELAHIDDÎN DIKEVIN, DIHERE Û LI PÊŞ ÎSKEMEYA WÎ ÇOKA XWE YA RASTÊ DATÎNE ERDÊ, SERÊ XWE JI WÎ RE DADIXE.

Institut Kurde de Paris

SELAHIDDÎN KENEKÎ SIVIK TÎNE SER LÊVÊN XWE. DÛ RE KEÇIK SERÊ XWE JI HÊKIM RE DADIXE Û DIHERE MASEYE ÎFADÊ - Mîra hêja, tu di sala 1176-an de, rojekê li bajarê Helebê çûyî mala Selahiddîn. Tu dikarî bi kerema xwe, sedem û netîceya çûyîna xwe jibo dadgehê bidî xuya kirin?

KEÇIK: Dû dijmintî û şerekî xwînîn di navbera dewleta Sultanê adil, Selahiddînê Eyûbî û birayê min Padîşah Essalih de; ya sultên bi ser ket û hemû hebûna birayê min ket bin destê dewleta wî. Dilê sultanê boke, yê gewre, sûc û şaşitiyên brayê min bexi--şandin. Lê dîsa jî em rûreş man, derek tune bû ku em pê de herin. Wisa, min biryar da ku ez bi xwe biçim mala sultên û wî bibînim. Deriyê wî ji her kesî re vekirî bû. Dema xeber gihîşt cenabê wî ku ez li eywana wî mêvan im, ew bi xwe hat,şûn da min û ji min xwazt ku ez daxwaza xwe ji wî re bibêjim. Ber ez wî bibînim, ez ji tirsan dicirifîm. Lê dema min sûretê wî yê bi ken dît û dengê wî yê pêximberîn bihîst, dilê min ji hemû şop û rêçikên tirsê azad bû û bi qudreteke xudayîn devê min vebû û zimanê min têde fertilî û got: 'Hezretî Cenabê Mewlane, sultanê adil. Deng û navê we li her çar beşên dinya Rebbê Alemê bi navê pêxemberîn belav bûne. Îroj malabat Essalih li erdê reş maye û derek tune pê de here. Wisa, min berê xwe da mala we bo ez beyan bikim ku ez û malbata birayê min di bin siya we de li derekê digerine.' Min dît, çawa

Institut kurde de Paris

hêstir di çavên sulatnê mezin de dibiriqine.Ez li ber lingên wî bi çokan ketim erdê û min got ku daxwaza min Kela Ezazê ye.Peyayê mîr bi destê min girt, ez ji erdê rakirim û bêyî ku dirêj bihizire, li çavên min rebena xwedê nihêrî û got:'Kela Ezazê ya te ye.' Tew nehişt ez destên wî yên mubarek jî maç bikim; sultanê xwedê yê li ser erdê. Wisa, bi xêra rindî û zorbûna Selahiddînê Eyûbî em di Kela Ezazê de bi cîh bûn.Me di rewşeke layîqî malbatên bi esil û fesil de jîna xwe bi emrê xudayê mezin û di bin siya sulatnê wî de domand.

XURŞÎD: Ez ji keça hêja, xûşka Essalih re ji dil jibo hatina wê spas dikim. -KEÇIK ÇAWA HAT HINDIR,WISA JÎ DIHERE DER- Şahdeyê min yê duwemîn, yek ji leşkerên Selahiddîn e.

LEŞKER:-BI KETINA HINDIR RE- Esselamû eleykum! -DIMEŞE Û LI PÊŞ SELAHIDDÎN ÇOKÊN XWE DIDE ERDÊ. DÛ RE RADIBE, SERÊ XWE JI HÊKIM RE DADIXE Û DIÇE BA MASEYA ÎFADÊ-

XURŞÎD: Leşkerê xoşewîst, bi kerema xwe ji dadgehê re li ser du-sê kirinên te ji Selahiddîn dîtine, bipeyîve!

-AZAD XWE DILIVÎNE Û DIXWAZE TIŞTEKÎ BIBÊJE,LÊ HAKIM WÎ, BERÎ KU DENG BIKE, BI ÎŞARETEKE DESTÊ RASTÊ, WEK KU BIBÊJE; BI KEREMA XWE GUHDAR BIKE, DISEKINÎNE-

LEŞKER: Ez leşkerekî ji leşkerên Seyfeddînê Zengî yê Duwemîn, Padîşahê Mûsilê, bûm. Dema leşkerên padîşahê

Institut kurde de Paris

me di bin seroketiya birayê wî, Îzzeddîn de şerekî mezin li hember leşkerên Selahiddîn Eyûbî derdan, Seyfeddîn bi xwe hemû leşkerên xwe li hev civandin û berên me dan Sûriyê. Di destpêka biharê de, sala 1176-an de, me çemê Ferêt debas kir.

Li başûrê bajarê Helebê herdu hêzên leşkerî li hember hev pan bûn û şerekî nayê hişê mirovan destpêkir. Dû şerê gewre em bi serketin û ti guman nema, em ê têkevin bajarê Helebê. Me êdî dest bi sitran û dîlanan kiribû! Ez ji we re çi bêjim! Bi nişkave qîrîn bi me ket. Selahiddîn leşkerên xwe yên şexsîn lihev komkiribûn, bi xwe ketibû pêşiya wan û li navîna me qelivandibûn.Ancax mirova bidîta ku bawer bikira! -SERÊ XWE DI HÊLA ÇEPÊ Û RASTÊ DE DILEQÎNE- Bi roava re yên ji me sax mayî bûn dîlên Selahiddîn. Me nav û dengê sultên, çêyî û rindiyên wî pirr bihîstibûn.Le Selahiddîn rûmeta xwe hîn bilindtir bû. Di wê êvarê de sultan Selahiddîn peyîvî û da zanînê ku leşkerên Seyfeddîn yên dixwazin li mal û xwediyên xwe vegerin, bila herin; bo yên naxwazin jî derî vekiriye, ku ew di bin ala dewleta musilmanan ya nû de pêşve herin. Hejmarek ji me, bi taybetî ew ên kurd ji wê demê şûnve bi sultanê mezin re man.Me bihîstîbû ku Selahiddîn dema bajarên dijminan vedike, malê di xizneyên padîşah û mîrên wan bajaran de li belengazên bajêr belav dike. Lê roja xizneya Seyfeddîn ket destê ew melikê comerd û

Institut kurde de Paris

dilfireh, wî bang qumandarên xwe kir û ferman da ku zêr û zîvê di xiznê de bila li leşkeran werin belavkirin. Ji wan zêr î zîvên pirr, pîllikek jî ne ket destên Selahiddîn bi xwe. Xweziya kat hebûya min ji we re li ser şerê Hittînê şor bikira! Mêjiyê min nabire ti caran şerekî wanî cîh girtibe! Bi şerê Hittînê, ya ku di sala 1187-an de li nêzîkî behra Teberiya cîh girtî, Selahiddîn û leşkerên wî bajarê Qudsê, yê ku 88 salan di bin destên xaçvanên Ewropa de mabû, rizgarkirin.Di wê rojê de sultanê sultanan erdê di bin solên leşkeran de bi çavên tijî hêstir ramûsand û got:'şukir xwedê, me ev roj jî dît.' -LEŞKER HEBKÎ VÊSÎ DIKE,DÛ KU AZAD YÊ KU WEK MIROVEKÎ JI SEBRÊ VALA BIBE DESTEKÎ XWE LI RÛYÊ MASEYÊ DIXE, LÊ HAKIM BI DESTÊN, XWE Û BI SERÊ XWE BI WÎ DIDE FEHM KIRIN KU EW ŞORA LEŞKER NEBIRE- Selahiddîn camêrekî bêtirs bû. Lê dikaribû bo xatirê mindalekî serê xwe daxe;Selahiddîn serbilind û stûr bû, lê ti caran xwe li serê belengazan mezin nedikir. Selahiddîn tirs û xof di kûraniya dilên dijminan de diçandin, lê ilşewat bû û dikaribû mezintiriyên dijminên xwe jî bibexşanda. Selahiddîn leşker bû, boke bû.Ew bi şev û roj di nav gel û leşkerê xwe de bû. Ew siya xwedê li ser erdê bû. -KELGIRÎ DIBE,DESTEKÎ XWE BI SER HERDU ÇAVAN RE DIXUŞÎNE- Selahiddîn yek bû li cîhanê.LEŞKER ÇAWA HAT WISA JÎ DIÇE DER.

XURŞÎD: Bi îzna te,hakimê gel.Ez ê niha bang berdestê Se-

Institut Kurde de Paris

lahiddîn bikim. -BERDEST DIKEVE HUNDIR Û DEMA SELAHIDDÎN DIBÎNE, DIREVE DESTÊ WÎ YÊ RASTÊ RADIMÛSE. HÊSTIRÊN XWE BI PIYÊ XÎLLIK DADIMALE. SERÊ XWE JI HÊKIM Û YÊN DIN RE DADIXE Û DIHERE BA MASEYA ÎFADÊ-Apo, bi kerema xwe ji dadgehê re li ser roja mirina sultanê xwe biaxife.

BERDEST: Ez bextereşê xwedê ji ku dest pê bikim, çi bibêjim, çi nebêjim! Di tûrikê min de ew peyvên ku bikaribin ji heqê pesna padîşahê padîşahan,Sultanê Yemen û Misrê, Quds û Şamê, Horan û Herranê, Hema û Helebê, Mêrdîn û Nisêbînê, Diyarbekir û Sincêrê, Mûsil û Hewlêrê derkevin tune ne.-AZAD DÎSA XWE DILIVÎNE, DIXWAZE BIPEYÎVE LÊ XURŞÎD BERÎ WÎ-

XURŞÎD: Biborin apo, bi kerema xwe ji me re bi kinî li ser roja mirina sultanê xwe bipeyîve!

BERDEST: Ez di bin emrê te de me maqûl! Sultanê meşriq û mexribê. Selahiddîn Yûsif, kurê Necmeddînê Eyûb di roja xwedê ya çarê mehê Martê (Adarê), di sala 1193-an de li bajarê Şamê, paytextê memleketê îslamê, di hindir odeyeke mala xwe de veketibû. Guhên xwe yên delal dabûn ser dengê muftiyê Şamê, yê ku ji rûpelên mushefa şerîf peyvên rebbê alemê yên mubarek dixwend. Dema cenabê muftî got: 'tenê ew xwedê ye û ez bi wî bawer dikim',sultanê mezin kenek şêrîn anî ser lêvên xwe yên muqeddes û ruhê xwe yê pak kir destê afirdarê erd û ezmanan. Xwelî li serê min ebdê xwedê be, ez ê çi

Institut kurde de Paris

bibêjim?! Dû wefatkirina sultên, yên di mala wî de amade bûn, ji çavên xwe bawer ne kirin ku di hindirê mala sultanê Yemen û Misrê, Sûriya û Binanê, Filistîn û Kurdistanê de pere tunebûn ku mirov gora wî pê bide kolandinê. Dema cenazeyê seydayê min rakirin, min paçikek ji kefenê wî qutkir. Min ew bi serê rumê de girêda,ez li tax û quncikên bajarê Şamê fertilîm. Min bangkir û got 'bila her kes li cîhanê bizanibe ku sulatanê memleketê îslamê, Selahiddînê qedirbilind, destê xwedê li ser erdê, îroj çû ku bibe cîranê yê ew afirandî; û di xizna wî ya şexsîn de tenê pere têra kirîna kefenekî hatin dîtin.-DESTPÊDIKE DIGIRÎ Û WEK HATÎ DIÇE DER-

AZAD: -BI QERF- Ger ne kurd bûya wisa ne dikir; mecbûr ne dibû wanî bike.

XURŞÎD:-YAN AZAD NABIHÎSE, YAN JÎ WISA XUYA DIKE; Û BI HÊKIM RE- Ez ji dadgehê re jibo sebra berêzên qedirbilind spas dikim. Tenê şahdeyekî min ma. Bi pejirandina hakimê dilmezin, bila nivîskarê dadgehê gazî wî mirovê qehreman bike. - NIVÎSKAR DIHERE DER. BI NIŞKAVA MIROVEKÎ BI KINCÊN LEŞKERÎ YÊN MÎRÊN SEDSALA DUWAZDAN DIKEVE HINDIR. DEMA ÇAVÊN SELAHIDDÎN LI WÎ DIKEVIN, RADIBE SER XWE Û BI LEZ BERBI WÎ DIÇE.HEVÛDIN HEMBÊZ DIKIN Û RÛYÊN HEV RADIMÛSIN. DESTÊN XWE LI PIŞTÊN HEV DIXIN.DÛ RE ŞAHDE DIHERE MASEYA ÎFADÊ- Mêvanê qedirbilind,hûn ê bikaribin bi kerema xwe, xwe bi dadgehê bidin nas-

Institut kurde de Paris

kirin?

ŞAHDE: Navê min Rîçard e. Ez bi navê Rîçard Dilê Şêr têm naskirin.- DEMA HAKIM Û AZAD VÎ NAVÎ DIBIHÎZIN, HERDU Û BI WAN RE NIVÎSKARÊ DADGEHÊ JÎ, RADIBIN SER LINGAN. EW SERÊ XWE JI RÎÇARD RE DADIXIN. EW RÛDININ-

HAKIM: Bila padîşahê bi nav û deng Rîçard Dilê Şêr,bi kerema xwe dest bi axiftina xwe bike.

RÎÇARD: Ber her tiştî, ez dixwazim dilşewatiya xwe bo bindestbûna gelekî jîr û fêde wek gelê kurd, yê ku peyayên wek Selahiddîn pêşkêşî mirovtiyê kirin,ji we re bidim zanîn. Hewce nake ez ji we re bi firehî li ser Selahiddîn bipeyivim. Ji ber ku dîrok biryara xwe di derheqê peyayên wek wî û min de dinivîsîne. Berî ku ez ji welatê xwe biçim Filistînê jî, min pirr li ser çêyî, kirin û camêriya Selahiddîn bihîstîbû. Piştî ku xiristiyanan şerê Hittînê derdan, çirok û metelok û gotin li ser edalet û comerdiya wî mirovî di devên xelkên welatên Ewropa de bûbûn benîşt. Êdî hinan ji mîr û padîşahên welatên roava ji ber xwe ve fedî dikirin û hin jî hebûn, yên ku bawer nedikirin ku sultanê musilmanan ê bikaribe hem şervanekî jîr û bê tirs be û hem jî dilmezin û zimanxweş be. -MASEYA ÎFADÊ LI ŞÛNÊ DIHÊLE Û LI SER SEKOYÊ DIHERE, TÊ- Li dawiya şerê Hittînê, padîşahê Qudsê Guy (Gay- tê xwendin) û hin mîrên din dîl hatibûn girtin û di hindir konê Selahiddîn de amade bûn. Selahiddîn tasek ava

Institut Kurde de Paris

gulan, ya ku bi berfa kaşê Hermon hatibû qerimandin, pêşkêşî padîşahê xiristiyan kiribû.Qedrê wî û hevalên wî bilind girtibû, ji yekî pêve. Ew jî Reynoldê Chatîlon bû. Selahiddîn di hindir konê de bi şûrê xwe serê wî ji stû firandibû.
Dema padîşahê Qudsê ev bûyîna dîtibû, ji tirsan re giriyabû. Selahiddîn li wî zivirîbû û gotibû: 'Metirs. Padîşah padîşahan nakujin.Ne jî ji sinçiyên min in ku ez dîlanan bikujim. Lê Reynold mirovekî derewçîn û bêbext bû. Ev cezayê min da wî layiqê yên wek wî ne.' Ez ê tenê du-sê tiştên din li ser Selahiddîn ji we re bibêjim.

Carekê di şer de hespa min ket û mir. Min dît, leşkerekî Selahiddîn, aleyeke sipî di dest de berbi min hat û hespekî çê pêşkêşî min kir.Leşker ji min re got ku Selahiddîn gotiye,heyf e camêrekî şervan û boke wek Rîçard li ser lingan şer bike. Selahiddîn dijminê me bû, lê me wek biran ji wî hez dikir. Pirr ji mîrên Ewropa bi wî re dostî û biratî danîbûn. Ji ber ku wan fahmkiribûn ew çi camêr e. Roja bajarê Qudsê dû 88 salan dîsa ket destên musilmanan, xiristiyanan wer dizanibûn ku ew roj ê bibe rojeke reş di jiyana wan de. Dema leşkerên Selahiddîn ketin Qudsê, xelkê ji çavên xwe bawer nedikirin. Li leşkeran tenbe (temî) bibû ku ew kêsekî nedin êşandin, û wisa,li şûna zulm û zorê,ew bi xelkê re alîkar derdiketin û ew ji hin musilmanên serhişk diparaztin. Bi hezaran endamên olên

Institut Kurde de Paris

xiristiyan û cihûyan li şûna piştî serokên xwe bigirin, ya Selahiddîn digirtin, ji ber ku wan dizanibûn, peyvên ji devê Selahiddîn tên der tu caran paşve nayên kişandin. Gotina min ya dawîn ev e: mirovên wek min û Selahiddîn ji padîşahan bêtir, leşker bûn. Me nedikarîbû rûnin. Em tim û tim li ser pişta hespan bûn. Em ji xelkê re rind bûn û me hêvî dikir xelk jî ê ji me re rind be, lê mixabin em hin caran dihatin xapandin. Ez bi xwe ji hêla birayê xwe John de û yên li dora wî, hatim xapandin. Ya ez dixwazim bibêjim ew e ku heyf e camêrên wek Selahiddîn werin mehkemekirin. Lê ez înkar nakim ku eger wî hîmê netewa kurd`di dema xwe de qewîn çêkiriba, gelê wî ê îroj di rewşeke din da bûya.

Berêzên qedirbilind, ya min dixwazt bibêjim,min got. Biryar ya we ye û ti guman li ba min tunene ku ew ê ji hêla Selahiddîn de were pejirandin.De bi xatirê we. -LI SELAHIDDÎN DINIHÊRE- Good luck my friend !

Institut kurde de Paris

****
* *
* Hakim û yên din radibin ser *
* lingan. *
* Perde tê xar. *
* *
****

PERDE

V

MEHKEME: RÛNIŞTINA SÊWEMÎN

XURŞÎD: Di rûniştina bihurîn de, şahdeyên me ti guman nehiştin ku:

1-Selahiddîn sultanê memleketê musilmanan bû,ne yê kurdan.

2-Di dîroka cîhanê de padîşahên dilpak, amancrind û adil wek Selahiddînê Eyûbî pirr hindik in.

Wisa, ne ji mafê kesî ye wesfên wek xiyanetê li dû navê camêrekî bi rûmet, wek Selahiddîn bixe.Ev îhaneteke gewre ye, ne tenê bo me, lê bo dîroka cîhanê jî. -BI HÊKIM RE- Ez bi navê edaletê ji hakimê gel tika dikim ku ew Selahiddîn bêsûc xuya bike.

HAKIM: Berêz Azad, bê guman te guhên xwe baş dan ser gotinên şahdeyên dadgehê. Yên di rûniştina bihurîn de bi kerema xwe ronahî avêtin ser hin kirinên Selahiddîn. Te bihîst ku Berêz Xurşîd ji mehkemê xwazt ku em Selahiddîn bêsûc derxin. Berî ku ez rê bidim Selahiddîn, bo ew bikaribe bi serbestî tiştên ew dixwaze xuya bike,ji mehkemê re pêşkêş bike; ez dixwazim bizanibim eger gotinên şahdan ti tesîr li bîrûbaweriya te kiribin; belkî di siya ew peyvên te li ser Selahiddîn bihîstin de mesele niha liber çavên te ketibe qalibekî din. Tu çi dibêjî?

AZAD: Hakimê xoşewîst, berî ku em Selahiddîn wînin ber edaleta dadgehê, me bi kûranî li hemû rêçik û qun-

Institut kurde de Paris

cikên meselê seyr kir, em têde baş mijûl bûn; me her tişt anî ber çavan. Ti guman di bîrûbaweriya me de nema ku Selahiddîn xiyaneteke mezin bi gelê bapîrên xwe re kiriye. Berî ku ez bipeyîvim, Berêz Xurşîd got ku Selahiddîn ne sultanê kurdan lê musilmanan bû ye. Em vê gotinê dipejirînin û tînin bîra we ku me di destpêkê de pirsek ji Selahiddîn pirsî, me got: 'Hûn kurd in an na?'Wî camêrî kurdbûna xwe ne kir ti siyan.-BI DENGEKÎ QEBE- Wisa, mafê gelê kurd heye ku wî bide mehkemekirin.

Tiştekî me li dijî şexsê Selahiddîn tune. Lê em dixwazin mehkemekirina Selahiddîn ji serokên kurdan yên îroj û sibê re bikin îbreteke mezin.Ew ê ji dest nayê seroketiya gelê xwe bike, bila nebe serok. Ew ên ku ji heqê seroketiyê dernakevin û bi şaşetiyên xwe yên mezin, gelê xwe dikin golên jan û êşê bila baş bizanibin ku ew ê rojekê ji rojan ji hêla gel de werin mehkemekirin. Bila ew nebêjin xweliya demê ê kêmasiyên wan bide veşartin. Ger dû pênc hezar sal be jî, ger ew li ezmanê heftan bin jî, gel ê wan rojekê daxe jêr û cezayên layiqî şaşetî, yan xiyanetên wan, li ser wan feriz bike. Edaleta Selahiddîn û têkoşîna wî bo musilmantiyê belkî jî bêhempa bin, lê çêyiya ku wî bo gelê xwe li şûn hişt, tenê ew e, ku ew ji malbateke kurd bûye. Ji ber ku ew ji malbateke kurd e,divabû ku wî ew fersenda zêrîn bo bilindkirin û pêş-

Institut kurde de Paris

vebirina netewa xwe xistiba kar û xebatê. Bo ew xeleta wî ya mezin, em wî xayîn xuya dikin û ji mehkemê dixwazin ku cezakî giran bo wî were dayîn.

HAKIM: Selahiddîn, ez niha rê didim we, bo hûn bi kerema xwe, bîrûbaweriya xwe di derheqê mesela em li ser sekinîne de xuya bikin. -SELAHIDDÎN DIÇE BA MASEYA ÎFADÊ Û BI DENGEKÎ LAYÎQÎ SULTANAN-

SELAHIDDÎN: Dema şansê mirovekî berê xwe dide jêr, diranên wî ê di elorê de jî bişikên. Ji hevdeh kurên min û ji birazêyên min, kesek ne bûye xwediyê sermiyanekî mezin. Li şûna biratî, wan bi hevre dijmintî kirine û hiştine memleketê min ji hev bikeve, ta ku monxol hatine û dikaribûne pergela wan belav bikin. -BI AZAD RE- Dar hijên xwe berdide kûraniya erdê, jînê li çemelên xwe belav dike û pelikên xwe kesk dike, wan mezin dike, lê belê berdewamkirina keskbûna pelan ne tenê bi xweztina darê ve girêdayî ye. Ba û baran, berf û serma, mûrî û kurm, hemû rolên xwe di derheqê domandina keskbûna pelan de dilîzin...

AZAD: Maqûl, dara we dara peyamê bû, lê pelikên xurman li ser çemelên xwe kesk kirin. -HAKIM XWE DILIVÎNE, LÊ AZAD DESTEKÎ XWE HEBKÎ RADIKE JOR, WEK BIBÊJE; BIBEXŞÎN-

SELAHIDDÎN: Berêz Azad, dema min dema olan bû, ne ya netewan! Di rojên min de xelkê gotina ummeta îslamê dikir. Alim , feqî û mamosteyên me digotin ku zimanê erebî xemil û zîneta ola îslamî ye û

Institut Kurde de Paris

wisa endamên gelê kurd wek musilmanên din dikirin ku ew zanibûna xwe li ser zimanê erebî baştir û kûrtir bikin. Yên bi wî zimanî baş dizanibûn serbilind bûn û dikaribûn xwe bigihênin şûnên bilind. Di xwendegehên bajarê Helebê de kesekî haya min nekişand ser edebiyata kurdî...

AZAD: Hûn sultan bûn, Selahiddîn! Bê guman we nav û dengên hin zaneyên kurd bihîstibûn, we...

SELAHIDDÎN: Erê, min bihîstibû. Lê zemanê min rê neda, bo lêkolîn li ser tiştên wisa cîh bigirin. Welatên musilmanan di talûkê de bûn. Pêşvebirina zimanê kurdî ne wezîfa min bû.

AZAD: Zor spas! Min jî dixwazt ku hûn bi xwe bidin zanîn ku sûda kurdan ne amanca we bû.

XURŞÎD: Ez li dijî ev gotina Berêz Azad im. Bi rastî, ew bi awakî nijadperest û hişk li meselê dinihêre. Bi gotina yên wek wî be, mafê mirovekî kurd nîne ew kelkê li neteweyeke din bike. Divê em her dem, tenê xwe di rewşa kurdan de mijûl bikin.

- AZAD RADIBE SER LINGAN Û BI DENGEKÎ PIRR QEBE-

AZAD: Ez nabêjim bila mirovê kurd ti sûdê negihîne neteweyên din. Mebesta min tiştekî din e, lê ger kesek wisa werdigerîne, xem nake. Bila Berêz Xurşîd bo min bide xuyakirin, ka çend meşan li Tehran û Ebedanê, an Enqerê û Îzmîrê, an Heleb û Şamê, an Besrê û Bexdayê bo mafê kurdan ta roja îroj cîh girtine! Hela bila kesek bo me bide zanîn, ka çend muftî û mellan di axaftinên mizgeftan yên rôjên înî de ser qedexe

Institut kurde de Paris

kirina zimanê gelekî musilman sekinîne?'Musilmanên dinê bibin yek' digotin ji bav û kalên me re; îroj jî bi siloganên din yeketiyê ji me dixwazin; peyvok hatin guhêrtin, lê ne amanc. Di dîroka gelê me de her dem yên din ji kurdan xwaztine ku bila ew ji agirên wan re bibin qirş û qal. Pismamên kevnebapîrên me yên medî, farisan welatê wan bi navê mêritiyê ji destên wan girtin.Ereban bi navê îslamê û tirkan jî bi navê biratiyeke derewîn û yeketiya li dijî 'gawirên dijmin'.

Îroj jî, dema em gotina serbixwebûn û rizgariya welatê xwe dikin, her kes me lomekar derdixe. Yên wekî Berêz Xurşîd hîn jî ji me dixwazin ku em agirê bi serê me ketî ji xwe bîra bikin û bibin şoreşgerên cîhanperwer. Zatî me mala xwe ava kir, em ê mala cîhanê jî ava bikin!

XURŞÎD:Min daxwazeke wisa nehanî ser zimanê xwe.-BI QEHIR JI HÊKIM RE- Berêz Azad dixwaze bi zorê Selahiddîn xayin derxe. Selahiddîn ti nokerî li dijî gelê xwe nekiriye. Kes nikare înkar bike ku navên kurdî yên ji malbata Selahiddîn ta rojên îroj li welatên Rohilata Navîn belav in!

AZAD:-BI KEN Û QURF- De werin em herin xwe bi qurbanê wan malbatên bi navê kurdî, yên ji malbatên Selahiddîn in bikin! Lo ez benî, ew malbat û navên wan çi sûdê li me bextereşên cîhanê dikin! Hin kurdên me, eslên malbata serokên hin welatên Rohilata Navîn jî dikin kurd! Heke malbatên wek cimbulat, an canpolat,yê Bi-

Institut kurde de Paris

nanê, Birahîn Henano û Şukrî Quwetlî yên Suriyê û Înîno yê tirkiyê ji bapîrên kurd bin jî, çi sûd bo me ji wan hatiye? Ger Berêz Xurşîd dike wan li serê me bi minnet ke, na welle, mafê wî tune. Belkî wan karên baş bo gelên din hanîbin cîh, lê ti sûd li gelê kurd nekirine.

XURŞÎD:Wisa, ew hemû xayinin ha?! -BI QEHIR- De werin em wan jî bidin mehkemekirin!

AZAD: Em nikarin wan bidin mehkemekirin. Ji ber ku ew xwe kurd nahesibînin. Lê Selahiddîn aşkere dibêje, ew kurd e.

XURŞÎD:Ez carek din tînim bîra mehkemê ku Selahiddîn sultanê musilmanan bû!

AZAD:-RADIBE SER LINGAN Û DIQÎRE- Sultanên Osmaniyan jî musilman bûn. Berî wan yên ereban jî sulatnên musilmanan bûn! Ez dixwazim ji te û yên wek te re çend bûyerên dîrokîn bibêjim, Berêz Xurşîd.

Padîşahê Misra kevnar, Kilyopatra, dema leşkerên Misrê li hember yên roman şikestin, yarî bi qeyserên roman re danî; bedena xwe jî da wan, lê ne welatê xwe, ne netewa xwe. Ew tew neçar ma û qeyserekî roman, Mark Antony kire mêrê xwe, lê jibo wî têxe xizmeta Misrê. Dema Mark Antony bo wê û welatê wê mir û Kilyopatra dît ew ê êdî nikaribe xwe û welatê xwe ji bindestbûnê biparêze, wê ferman da berdestan ku ew marên bi jehr berdin odeya wê. Bo wê, mirina bi devê maran ji rûreşiya wê li ber çavên gelê Misrê

Institut kurde de Paris

şêrîntir bû.Ev bûyera sîh salî berî pêxember Îsa cîh girtiye. Berî kilyopatra, Mûsa, tev ku pêxem - ber bû jî, ew bo gelê xwe, Benî Îsrayîl têdikoşiya. Muhemmed, pêxemberê musilmanan got ku xwedê gotiye 'me ev qurana bi zimanê erebî daxist', wisa îslam kir xizmetê gelê ereb. Mîşel Efleq, damezdarê partiya EL BA'S EL EREBÎ ye ku bi xwe xiristiyan e dibêje, Muhemmed berî her tiştî şoreşgerê yekemîn yê netewa ereb e. Di dîrokê de, berê, niha î dûre jî, neteweya mirovan di amanc û felsefa wan de her dem roleke gewre lîstiye, dilîze û ê bilîze...

- SELAHIDDÎN RADIBE SER XWE. BI RABÛNA WÎ RE AZAD JI ŞORA XWE EWARE DIBE-

SELAHIDDÎN:Berêzên qedirbilind, min guhên xwe baş dan ser gotinên Berêz Xurşîd û Berêz Azad. Ez dixwazim ku hûn bi kerema xwe rê bidin min, bo ez bi kurtî çend gotinan bikim.

Ez bi bîrûbaweriyeke kûr gotina xiyanetê di derheqê şexsê min de paşve vedigerînim.Lê belê ti guman niha li ba min neman ku min şaşetiyeke mezin di derheqê gelê bapîrên xwe de kiriye. Ew jî ji lewra ku min zanibûna xwe li ser dîrokê û li ser jiyan, dan û standin di navbera gelan de nikaribûye kûrtir û çêtir bikim. Ji ber ku ez sultan bûm, sûcê kêmasiyên min dikeve stûyê min. Şora Berêz Azad rast e. Ger min di dema xwe de bikariba bi awakî mentiqî û kûr wêbeya gelê kurd bida ber çavan, rewşa gelê kurd

Institut kurde de Paris

ê bêguman di rojên îroj de baştir bûya.-KELGIRÎN DIBE- Wisa ez xweliya binê lingên ew ên bo netewa,kurd canfida bûne radimûsim û ji yên ku îroj belengaz, bindest û sirgûn bûne, an jî di şevreşiya zindanan de dinalin tika dikim, ku ew min bibexşînin.

- XURŞÎD MATMAYÎ DIMÎNE, AZAD JI ŞÛNA XWE RADIBE, DIHERE BA HÊKIM Û DI GUHÊ WÎ DE DIPEYÎVE-

Ez fêhm nakim, çawa navê welatê pêxemberê îslamê îroj erebîstan e. Ez tê nagihêm çawa dewleta tirk hebûna kurd înkar dike. Ez nizànim çawa welatên musilmanan dihêlin ev zulm û zordariya li kurdan dibin, dombikin. Ger mirov rewşa îro bide ber çavan, gotina ku 'di dîrokê de her kesî kurd xapandine', di şûnê de ye. Gelo ev ji bo pakbûna dilên kurdan e,an ji dest nerindî û ezotiya yên din e? Gelo pakbûna niyeta mirovekî li hember xasûkî, fen û fûtên yek din nezantî û xeşîmtîye?! Sedem çi dibin bila ew bin. Ya rast ew e ku, sûcê mirovekî kurd, bi taybetî yên serok, di bindestbûna gelê kurd de heye. -LI PÊŞMERGE DINIHÊRE-

Kurê min, bi kerema xwe tasek av ji min re wîne.

-PÊŞMERGE TASEK AV TÎNE.SELAHIDDÎN TASÊ DI DESTÊ XWE YÊ ÇEPÊ DE DIHÊLE, PÊŞMERGE ÇAR

Institut kurde de Paris

PÊNC GAVAN PAŞVE DIHERE. SELAHIDDÎN ŞORÊN XWE DIDOMÎNE- Di jiyana xwe de, min ta j rojaa mirinê bo serketina peyva xwedê têkoşîn kir. Daxwaza min ew bû, ez di şerde bo olaı îslamê canfida bibim, lê bi emrê Rebbê Alemê ez di şeltê de mirim. Wek hûn dizanin, ola îslamê xwekujtinê qedexe dike. -HAKIM Û YÊN DIN LI ÇAVÊN HEV MÊZEDIKIN, SELAHIDDÎN DIDOMÎNE- Tiştên ku dû mirina min hatine serê gelê kurd, min fedîkar dikin. Ez bi xwe, ji ber xwe ve şerm dikim.

Li milê din, ez naxwazim di dîrokê de were xuya kirin ku dadgeheke Kurdistanê dû mirina Selahiddîn bi heşt sed sal cezayekî giran bo şaşetiyên wî, di derheqê gelê kurd de, da wî. Bila gelê min bizanibe ku min bi xwe şaşitiyên xwe pejirandin.-DESTEKÎ XWE DIRÊJÊ PÊŞMERGE DIKE, WEK KU DIXWAZE TASÊ BIDE WÎ.PÊŞMERGE DIGIHÊ SELAHIDDÎN. DESTÊ XWE YÊ ÇEPÊ TEV TASÊ LIDOR STÛYÊ PÊŞMERGE DIGERÎNE Û DI GUHÊ WÎ DE DIBÊJE- Bibexşîn lawê min.-BI VÊ GOTINÊ RE XENÇERÊ PÊŞMERGE JI BER DIKIŞÎNE Û DI BIN PARSIYÊN HÊLA ÇEPÊ RE DI DILÊ XWE RE DIKE.PÊŞMERGE NAHÊLE SELAHIDDÎN BIKEVE.NIVÎSKARÊ DADGEHÊ DIHERE ALÎKARIYA WÎ Û HERDU SELAHIDDÎN LI SER MASEYA ÎFADE VEDIXIN. HAKIM, AZAD Û XURŞÎD LI DORA SELAHIDDÎN DIHERIN TÊN. NIZANIN ÇI BIKIN. ŞAŞ Û MAT DIBIN.NIVÎSKAR DIGIRÎ. PÊŞMERGE LI

Institut Kurde de Paris

SER SEKOYA ŞANOYÊ DIHERE Û TÊ. XENÇERA BI XWÎ-NA SORBÛYÎ DI DESTÊ RASTÊ DE RADIKE JOR Û BI DENGEKÎ DILŞEWITÎ-

PEŞMERGE: Bila bûyera îroj ji her kesî re bibe îbreteke mezin!
Bila bûyera îroj ji her kesî re bibe îbreteke mezin!
Bila bûyera îroj ji her kesî re bibe îbreteke mezin!...

PERDE TÊ XAR

Institut kurde de Paris

BEŞEK JI MALBATA EYÛBIYAN*



*Şahînê B. Sorekli

Çavî: Runciman, S. A HISTORY OF THE CRUSADES, Vol. 3, University Press, Cambridge, 1955

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Institut Kurde de Paris
IKPLIV107946